Maahanmuuttovirasto
Migrationsverket
Finnish Immigration Service

TURVAPAIKKA-, MAAHANMUUTTO- JA KOTOUTTAMISRAHASTO
Euroopan unionin tuella

# Guhdarîkirina Dublînê li Daîreya Koçberan

Tu bo guhdarîkirinê hatî bangkirin Daîreya Koçberan. Vê şîretê baş bixwîne ku behsa maf û erkên te di guhdarîkirinê de dike. Eger pirseke te derbarê şîretê hebe, dikarî li destpêka guhdarîkirinê ji karmendên Daîreya Koçberan bipirsî.

## Armanca guhdarîkirinê çi ye?

- Te ji Fînlandayê daxwaza penaberiyê kiriye. Daîreya Koçberan bi hûrgilî lêkolînê li ser daxwaza te nake heta ku pêşî neyê zelalkirin ka kîjan welat ji lêkolîna daxwaza te berpirsiyar e.
- Di guhdarîkirinê de wan mijaran zelal dikin ku dikarin tesîr hebe ka daxwaza te li Fînlandayê were lêkolîn yan na. Di guhdarîkirinê de sebebên daxwaza penaberiyê nayê lêkolîn.
- Ka kîjan welat ji lêkolîna daxwaza te berpirs e, li gor qanûna Yekîtiya Ewropayê, wek dibêjin fermannameya Dublînê diyar dibe.
- Daîreya Koçberan bi guhdarîkirina Dublînê zelal dike ka kîjan welat ji lêkolîna daxwaza te berpirsiyar e û gelo Fînlanda dê lêkolînê li ser daxwaza te bike yan na.
- Hemû welatên Yekîtiya Ewropayê, Norwec, Swîsre, Îzlanda û Liechtenstein endamên peymana Dublînê ne.
- Dibe daxwaza te neyê lêkolîn hingê jî eger te ji welatekî din yê Yekîtiya Ewropayê mafê parastina navneteweyî wergirtibe. Hingê mesele ne rêkara Dublînê ye.

Hingê di guhdarîkirinê de tê zelalkirin ka tevî wê jî çima li Fînlandayê daxwaza te were lêkolîn.

- Eger li Fînlandayê endamên malbata te hebin, dikarî daxwaza îqameya malbatî bikî. Ew daxwazeke cuda ya îqameyê ye û bi pere ye.

## Di guhdarîkirinê de mafên te çi ne?

- Mafê te heye parêzer anku avukat li gel xwe bînî guhdarîkirinê. Parêzer bi xwe biryara beşdarîkirinê dide.
- Divê tu bi xwe parêzerekî peyda bikî. Eger parêzerekî peyda nekî bo guhdarîkirinê, em dikarin bêyî parêzer jî guhdarîkirinê saz bikin.
- Di guhdarîkirinê de tercimanek heye. Karê terciman wergirandina bêalî ya her tiştî ye ku di guhdarîkirinê de tê gotin. Terciman dibe ku li cih be yan jî bi telefonê yan bi vîdyoyê di têkiliyê de be.
- Erkê nepenîparastinê li ser lêpirsker, terciman û parêzer heye, anku nabe ew tiştên di guhdarîkirinê de bihîstiye bo ti kesî li derve aşkere bikin. Em dikarin gotinên te ji endamên balbata te jî veşêrin eger aşkerebûna wan bikare xeterê yan ziyanê bigihîne te yan kesekî nêzîkî te. Dikarî di guhdarîkirinê de nêrîna li ser wê yekê bibêjî.
- Belgenameyên derbarê te wek xala destpêkî bi nepenî tên parastin.

## Di guhdarîkirinê de çi erkên te hene?

- Di berjewendiya te de ye ku behsa hemû tiştên ku tesîrê li daxwaza te dikin bi xwe bibêjî.
- Di berjewendiya te de ye ku behsa mijarên zehmet jî bikî.
- Eger tiştekî nizanî yan neyê bîra te, hewl nede ku bersivekê ji bal xwe ve çêkî. Dayîna agahiyên nerast dikare bibe sebebê bawernekirina ji dawa te.
- Di guhdarîkirinê de nasnameya xwe rast bibêje. Eger belgenameyên ku nasnameya te pê zelal be tine bin, divê hewl bidî wan peyda bikî û bigihînî Daîreya Koçberan. Ev belge bo nimûne belgeyên nasnameyê û belgeyên seferkirinê ne. Tu dikarî dûvre agahiyên nasnameya xwe tenê bi belgenameyên resmî yên hikûmî biguherînî. Tu dikarî dûvre agahiyên nasnameya xwe tenê bi belgenameyên resmî yên hikûmî biguherînî.
- Daîreya Koçberan agahiyên nasnameya te di sicila karûbarên biyaniyan de qeyd dike ku tomareke hikûmî ye û di meşandina karûbarên dawanameyên te dixebitîne.
- Dayîna agahiyên nerast yên nasnameyî bo karbidestan yan bo tomarkirina di qeydên fermî de tawan e û tê cezakirin.

- Haydar be ku dayîna agahiyên şaş yan veşartina agahiyên rast dikare paşî bibe sebebe betalkirina îqameya ku hatiye dayîn yan meşandina karûbarên te dijwar bike.

## Çawa xwe bo guhdarîkirinê hazir bikî baş e?

- Berî guhdarîkirinê hemû şîretên karbidestan dayî te bixwîne û bîne bîra xwe. Giring e ku tu belavokên derbarê rêkarên Dublînê binasî. Eger ew belavok li ba te nebin, dikarî wan ji malpera Daîreya Koçberan peyda bikî: migri.fi/esitteet. Belavok li bin sernavê "Turvapaikka ja Dublin-menettely" (Penaxwazî û rêkara Dublînê) ye.
- Eger ji ber sebekek maqûl hêvî bikî ku terciman an lêpirsker jin an mêr be, berî roja guhdarîkirinê bibêje karmendekî kampa xwe. Karmend dê hêviya te bigihîne Daîreya Koçberan. Daîreya Koçberan biryar dide ka sebeb maqûl e.
- Eger halê te yê laşî yan ruhî wisa be ku tesîrê li ser guhdarîkirinê bike, bibêje karmendekî kampa xwe. Karmend dikare bi izna te berî guhdarîkirinê wê bibêje Daîreya Koçberan.
- Xwarinê yan pare bo firavînê li gel xwe bîne.
- Dermanê bi rojê bo te lazim bin li gel xwe bîne.
- Hemû wan belgename û îsbatan li gel xwe bîne ku têkilî dawa te ne.
- Zarokan li gel xwe neîne eger ew jî nehatibin gazîkirin bo guhdarîkirinê. Eger tu hewceyî çavdêriya zarokan bî, berî roja guhdarîkirinê bibêje kampa xwe.
- Berî dema xwe were. Bo gihiştinê zû bi rê bikeve. Kampa te dê şîretan bide te ku çawa dikare bigihî Daîreya Koçberan.

## Roja guhdarîkirinê li Daîreya Koçberan wiha bike

- Nikarî bêyî sebebekî rewa dema guhdarîkirina xwe paş bixî. Eger roja guhdarîkirinê nexweş bî, yekser navenda pêşwazîkirina xwe agahdar bike. Divê tu gotareke hemşîreyan yan bijîşkan derbarê nexweşiya xwe bigihînî Daîreya Koçberan ne derengtir ji 1 hefteyê ji roja guhdarîkirinê ve. Eger bêyî sebebeke maqûl li guhdarîkirinê hazir nebî, dikarin bêyî guhdarîkirinê biryar were dayîn.

- Gava tu tê avahiyê Daîreya Koçberan, dikarin teftîşê li te bikin.
- Karta xwe ya mişteriyatiyê nîşanî dergehvanê Daîreya Koçberan bide.
- Tenê kesên gazîkirî dikarin bên avahiyê Daîreya Koçberan û kesên ku biryar li ser hatina wan li gel te hatiye dan.

- Eger bixwazî alîkarek li gel te bê, tu yan ew dikare pêştir bi nivîskî ji Daîreya Koçberan daxwaz bike. Wek din lêpirsker biryarê dide ka alîkar dikare beşdar bibe yan na. Alîkar ne parêzer e û beşdarî ronkirina meseleyê nabe.
- Lêpirsker karmendekî Daîreya Koçberan e. Ew dikare li cih be yan jî bi riya vîdyoyê beşdar bibe.
- Dengê guhdarîkirinê tê qeydkirin. Li odeyê herwiha kameraya çavdêriyê ya qeydker heye.
- Eger hewce be bêhnvedan di guhdarîkirinê de tên kirin. Tu dikarî herdem dawa bêhnvedanê bikî.

## Di guhdarîkirinê de çi dibe?

- Destpêkê lêpirsker dibêje ka di guhdarîkirinê de çi dibe û piştrast dike ku tu maf û peywirên xwe fehm dikî. Bipirse eger tiştekî fehm nekî. Bibêje eger ji terciman fehm nekî.
- Lêpirsker van tiştên jêrîn ji te dipirse:
  - agahiyên nasnameyê
  - agahiyên malbatê û mirovan
  - agahiyên îqameyan, vîzeyan û dawayên penaberiyê li welatên din
  - agahiyên mayîna li Ewropayê berî hatina Fînlandayê
  - riya hatina Fînlandayê
  - sebebên ku çima nabe te vegerînin welatekî din
  - sebebên ku divê daxwaza te li Fînlandayê were lêkolîn eger te parastina navneteweyî li welatekî din wergirtibe.
  - nêrîna te li ser derxistina ji û qedexekirina hatina welat
- Rastgo bersiva pirsan bide. Bersiva ji ba xwe ve çêneke. Bibêje eger tiştekî nizanî yan neyê bîra te.
- Daîreya Koçberan dikare di guhdarîkirinê de derbarê mijarên tesîrker li ser biryarê ji te bipirse. Bo nimûne, eger şik hebe ku te li Fînlandayê tawanek kiriye yan tu hatî hukimdan, dibe ku tesîra wê li ser biryara Daîreya Koçberan hebe. Daîreya Koçberan di guhdarîkirinê de derfet dide ku tu nêrîna xwe li ser bibêjî.
- Bîrnameya hevpeyivînê tê nivîsîn. Li gor naveroka hevpeyivînê yan bîrname nayê pêdeçûn, yan li gel te tê pêdeçûn yan jî rojekê didin te daku zêdekirin û verastkirinên li ser bîrnameyê bişînî. Hevpeyivînker ji te re dibêje ka dê çi li bîrnameyê bikin.

## Piştî guhdarîkirinê çi dibe?

- Di fermannameya Dublînê de ew sebeb hatine diyarkirin ku çawa welatek ji lêkolîna daxwaza te berpirsiyar e. Ew sebeb ev in: 1) endamên malbatê li welatekî Dublînê, 2) vîze yan îqame li welatekî Dublînê, 3) mayîn yan meşîn li welatekî Dublînê, 4) daxwazeke penaberiyê ya berê. Daîreya Koçberan van hemû sebeban vedikole, li gor rêzbendiya giringiyê di fermannameya Dublînê de.
- Eger paşî bixwazî zêdetir agahî yan belgeyan pêşkêş bikî, bi nivîskî bişîne. Em li ser telefonê behsa mesela te nakin, çunkî em nikarin piştrast bin ka telefonker kî ye.
- Daîreya Koçberan biryarê li ser agahiyên te di guhdarîkirina penaberiyê de dayî û belgeyên din yên pêşkêşkirî dide. Daîreya Koçberan dikare bo biryarê li agahiyên giring ji çavkaniyên aşkere li bigere.
- Eger biryar bidin ku te vegerînin welatekî din, mafê te heye li dadgehê itiraz bikî. Dikarî ji dadgehê bixwazî ku li Fînlandayê bimînî heta ku dadgeh itiraza te bimeşîne.
- Eger daxwaza te li Fînlandayê neyê lêkolîn, dikarin te vegerînin û qedexeya hatina Fînlandayê li ser te bidin.
- Eger dawa te neyê lêkolîn yan dawanameya xwe betal bikî, dikarî dawa alîkariya vegera dilxwazane bikî. Bo wergrtina alîkariyê hinek şert hene û tên lêkolîna gava ku daxwaz bikî. Ji navenda pêşwazîkirina xwe şîretan bipirsî yan li agahiyan û têkiliriyan li malpera şîretên vegerê ya Daîreya Koçberan binêrîn migri.fi/paluu.